

## TRT6 Kûve diçe!?

Enehîte Murad

**Li** vê dawiyê û ji berî du salan ve, rejîma Tirkîyê piştî biryara xwe bi vekirina kanala TRT6 wergirtibû . Li pêş raya giştî ya der û hundir nemaze ya Kurd , wê aşkere dikir û digot : Ev kanala ji bo xizmeta hemwelatîyên Kurd ên Tirkîyê ye ! Ta ku ew bi hesanî karibin huner û zimanê xwe vejînin û geş bikin . Wisan jî , birek ji Kurdan didîtin ku, ev yeka li ser rîya demokirasî û mafên mirovane gaveke berçav û bêlîkirî ye.

Ew rikgirî, setem, cudahî û zordariya ku, ji evqas sal ve ,ya desthilatdarên Turkan û yek li dû yê dî li serê Kurdên rojnedîtî dimeşînin, yê bêgûman û di paşerojê de ji ser Kurdan rabibe ?!. Hîngê heyameke demokratîk yê di hundir dewleta Tirkîyê de cî bigire !?.

Lê, pir zor mixabin, piştî demeke kurt rejîma Tirk bê şerm û fedî dijîtî û çavsoyîya xwe, di dermafê zimanê Kurdî de aşkere dikirin ! Roj ji rojê, bihna tirkçîtiyê ,ya teng û kufîkî ji TRT6 hildikele, çavtengî li Kurd û zimanê wan yê şêrî aşkere dibe, nemaze ji nîfşên nûguha re baş diyar dibe. Û herweha ew îro bûye piropagandeya rejîma Tirkîyê û bi rengê fermî fermana qedexekirina hin gotinên kurdî didan û didin. Li gora agihîyan , TRT6, birek ji peyv û gotinên kurdî yê resen qedexe û herqedexe dike. Evên jêrîn gurzek ji wan gotinên qedexekirîne: *Aram, arîşe, artêş ,asayî , asteng , belavok , bûyer , çalaki dadgeh , damezrandin , darayî , dîmen , dîrok , dozger , ewleyî , ewlekarî , erdnîgarî , êrîş , fermî , gerdûn , girîng , helwest, hîndekar , komar , kovar , maf , merc , mijar , nakokî , navnetewî , netewe , nexşe, nijad , nûjen , parêzger , pejirandin , perwerde , pîşesazî , pêşkêş , pêvajo , bijîşk , raman , raya gel , rexne rêxistin , rizgarî , şano , şaredarî , taybet ,*

*têkoşîn, tenduristî, wêje , qedexe, zanîngeh, zanyarî , Kurdistan , milletê kurd, û H .W.D*

Ma gelo! Çima rejîma Tirk ji ya xwe namîne û herdem armanca xwe , bi pêlwazî û derewan hawil dide û dike, bi hesanî xwe di ser pîrsgirêka doza gelê Kurd re davêje û wê bincil dike ! Heyif û mixabin ku rejîma Tirk , li pêş raya giştî, di pîrsgirêka Felestîn-Îsraîl,û Sûriyê de xwe mîna kesên xêrxwez nîşan dide û pir pêwîste ku ala aşîti ,wekihevî û demiqursiyê di rojhilata navîn de, bi destên rejîma Tirk were hildan , qet ew nizane ku bi vê awî xwe di rûpelên dîrokê de nemaze li pêş nîfşên nûguha rûreş û şermezar dike ..

\*\*\*\*\*

## Pêpsiyan Hertim vexwin!?

Pêpsî vexwerineke mêr ,jin û zarok tev jê hezdikin û li malan tim tê dîti. Nabe mîvanek were çi malê û pêpsî venexe ! . Birastî ,di nav xelkê me de, ew vexwerineke bingehe ye .Tucar kes ne pîrsî ye, pêpsî sûdar e an na!

Erê rengê şûşê sipî ye , bi qabê hişîn e , li ser aşkere xuyakirine , pêpsiya me ji çi çê bûye wek : Şekir ,rengê keremêlê ,madak tîrş û kefeyînê ye , ji çend heyvan ve çê bû ye û piştî çend heyvan têkdîçe . ?

Rengê wê reş e ,mirov dibêjin gelek xweş e . Tiştê li ser nûgihan pir akam û bendor dike û wê pir bi lez dikirin û xweş-xweş vedixin . Wê wêneya fantaz a li ser şuşê û wê peyvên li bin wê tîn nivîsandin , pir stranbêjên ku xortên nûgiha jê hezdikin , pîrpegandên têvel ji bo wê vexwerinê çê dikin û wê bi mirovan xweş dikin ne wilo !? . Qet ew nizanin ew tun vexwerina ,çiqas zirar bi canê mirovan dike :Hestiyan dihelîne , diranan qul dike ,zikê zarokan sancî dike .. .H.W.D Wekî mezinên me gotibûn: Ne hertiştêk vexwerinê ,yan jî xwerinê xweş be ,sûdan li canê mirovan dike, we got çi?.